TORONTO ARTS_COUNCIL

# RAHÊNERIYA HUNERMENDÊN PENABER Û YÊN NÛHATÎ

# 2026 RÊNÎŞANA BERNAMEYÊ

***Roja Dawî Ya Serlêdanê: 13 Avrêl 2026***

---

TAC girêdayî bi wekhevî û hewandinê ye. Em serlêdanên hemû hunermendên li Torontoyê qebûl dikin û wan teşwîq dikin, ku kesên li jêr digire nav xwe lê bi wan sînorkirî nîne: Hunermendên reşik, Hunermendên xwecihî, hunermendên reng, hunermendên Kerr, ên astengdar an jî yên ku bi nexweşiyên mental dijîn, hunermendên ku xwe wek 2SLGBTQIAP didin nasîn, hunermendên nûhatî û yên penaber, hunermendên ciwan û yên nû dikevin qadê û hûnermendên ku ji derveyî navenda bajêr kar dikin. Zêdetir hîn bibin ka em çi dikin ji bo ku em TAC bêtir gehînbar û hewînertir bikin di Çarçoveya me ya Wekheviyê de.

---

## Ev bername piştgiriya çi dike?

Bernameya Rahêneriya Hunermendên Penaber û yên Nûhatî destegê dide hunermendên penaber û yên nûhatî ji bo ku hunera xwe ya pratîkê bi pêş bixin û entegrasyon û hewandina xwe ya li Torontoyê hêsantir bikin. Em kesekî nûhatî wek: koçber an jî penaberê ku ji 7 salan kêmtir li Kanadayê jiyaye; penaber jî wek kesek ku mecbûr maye ji welatê xwe derkeve û niha li Kanadayê bi cih bûye, rave dikin.

Bername destega pereyê dide hunermendên profesyonel* ên penaber û yên nûhatî ji bo ku di qada xwe ya hûnerê ya bijartî de rahênerî (rêbertî) li wan bê kirin.

Serlêdana rahêneriyê ji aliyê hunermendên penaber û yên nûhatî bi rahênerên wan wek hev-serlêder tê radestkirin. Divê hem serlêder û hem jî rahêner wek hunermendên profesyonel* bên ravekirin.

Hunermendê profesyonel:

- kesek e ku hunera xwe bi perwede û/an jî pratîkê bi pêş xistiye;
- ji aliyê hunermendên din ên di heman qada hunerî de kar dikin wek yekî profesyonel tê naskirin;
- bi awayekî çalak hûnera xwe pratîk dike;
- heqê hunera xwe distîne, û eger ji hêla aborî ve gengaz be dê zêdetir dema xwe bi çalakiya hunerî derbas bike;
- û xwedî dîrokeke pêşkêşiya civakî, weşandin û/an jî hilberînê ye

**Tevahiya mîqdara bexşê $15,000 e.**

• $7,500 rasterast ji hunermendê penaber an jî yê nûhatî re tê dayîn

• $7,500 rasterast ji rahêner re tê dayîn.

Eger hûn hunermendeke penaber an jî nûhatî bin û hewcedariya we bi peydakirina rahênerekê yan jî xizmetên wergerê hebe, ji kerema xwe serî li Liza Mattimore, Gerînendeya Bernameyê, Destpêşxistina Stratejiyê berî 13ê Adara 2026an, li 416.392.6802 x231 an jî li liza@torontoartscouncil.org.

## Bexşa gehînbariyê ya TACê

**Projeyên ku hunermendên Kerr û hunermendên xwedî astengî digirin nav xwe** dikarin ji bo ***bexşa gehînbariyê ya TACê ya*** zêdehî serlêdanê bikin ku ew jî heya zêdetir $5,000'î dê dabîn dike wekî berginda lêçûnên gehînbariyê yên hunermendan yên di heyama projeyê de. Lêçûnên gehînbariyê yên li jêr digire nav xwe lê bi wan sînorkirî nîne: wergera Zimanê Îşaretan, pênaseyên guhdarkî, jêrnivîs, alîkarên danûstandinan,

alîkarên xudankirinê (alîkarên xudankirina Mezinan jî tê de), xebatkarên piştgiriyê û kirêya aletan an jî piştgiriyên din ji bo ku pêwîstiyên gehînbariyê yên hunermend pêk werin.
Bexşa gehînbariyê ya TACê, ku di sala 2026an de destpê dike, dê destûrê bide wergirên bexşê ku li heyama projeya xwe çi dema ku bixwazin serlêdana Bexşa Gehînbariyê bikin. Bexşa Gehînbariyê di sala 2026an de wekî serlêdaneke cuda dê ji wergirên bexşê re berdest be.

## Proje kengê dikare dest pê bike?

Rahênerî dibe ku beriya 1ê Tîrmeha 2026-an dest pê nekin. Divê hemû çalakiyên rahêneriyê heta 30ê Pûşpera 2027an bên timamkirin.

## Kî dikare wek Hunermendê Penaber û/an jî Nûhatî serlêdan bike?

- Hunermendên profesyonel ên ku di qadeke hunerî de dixebitin (li pênaseya li jor binêrin)
- TAC haydar e ku ji ber hin astengiyên sîstemîk di nav civaka hunerê de (wek derfetên kêm ên nasandina sereke ji bo hunermendên civakên ku li pey wekheviyê ne) dibe ku di şîrovekirina krîterên mafdariyê de hinek hêsankarî bê xwestin da ku tecrûbe û naverokên profesyoneltiyê bi wekhevî bê hesibandin. Serlêderên potansiyel ên ji civakên li pey wekheviyê ne tên teşwîqkirin ku mafdariya xwe bi Gerînendeyê Bernameyê nîqaş bikin beriya ku serlêdana xwe radest bikin.
- Serlêder divê niştecihên Bajarê Torontoyê bin.
- Serlêder divê piştî 1-ê Rêbendana, 2019 hatibin Kanadayê.
- Divê serlêderan destûra xebatê ya derbasdar hebin û di dema nahêneriya wan de bi qanûnî destûr hebin ku li Kanadayê bixebitin.
- Serlêder divê xwedî SIN bin (Jimareya Sîgorteya Civakî)
- Wergirên berê yên vê bernameya bexşê nikarin serlêdan bikin.
- Hunermendên profesyonel ên ku xwendina lîsans an jî masterê didomînin, nikarin ji bo karên têkildarî bernameya xwendina xwe serlêdan bikin.

## Kî dikare wek Rahêner serlêdan bike?

- Hunermendên profesyonel ên ku di qadeke hunerî de dixebitin (li pênaseya li jor binêrin)
- Xebatkarên profesyonel ên hunerê gerînendeyên hunerê jî tê de, kurator û hilberînerên ku di qadeke hunerî de dixebitin
- Serlêder divê niştecihên Bajarê Torontoyê bin, kêmtirîn 1 sal beriya serdema serlêdanê li Torontoyê bijîn û kêmtirên 8 mehên salê li Torontoyê bijîn û kar bikin.
- Divê serlêderan destûra xebatê ya derbasdar hebin û di dema rahêneriya wan de bi qanûnî destûr hebin ku li Kanadayê bixebitin.
- Serlêder divê xwedî SIN bin (Jimareya Sîgorteya Civakî)
- Hunermendên profesyonel ên ku xwendina lîsans an jî masterê didomînin, nikarin ji bo karên têkildarî bernameya xwendina xwe serlêdan bikin.
- Rahêner tenê serê salê ji bo yek bexşa Rahêneriya Hunermendên Penaber û Nûhatî dikarin wek hev-serlêder bên nîşankirin

## Çawa ez ê serlêdan bikim?

Serlêder têne teşwîq kirin ku berî şandina serlêdanê bi Liza Mattimore, Rêvebira Bernameyan,Destpêkeriyên Stratejîk re biaxivin. Ji kerema xwe re têkiliyê bi Liza re çêbikin ji bo ku randewûyekê eyar bikin da ku hûn teklîfên xwe pê re nîqaş bikin: 416.392.6802 x 231 an jî liza@torontoartscouncil.org.

Hem serlêder (Hunermendî Penaber û/an jî Nûhatî) û hem jî Hev-serlêder (Rahêner) divê wek serlêderên

takekes di TAC Grants Online de bên qeydkirin https://tac.smartsimple.ca. serlêder nikarin navnîşaneke e-mail bi kar bînin ku ji hêla rêxistin an jî têkiliyeke kolektîf ve tê bikaranîn.

Serlêder pêwîst e di TAC Grants Online de bên qeydkirin (https://tac.smartsimple.ca) û serlêdena xwe beriya saet 11:59 roja dawî ya serlêdenê radest bikin. TAC serlêdenan bi çi rêyên din qebûl nake. Hûn ê emaileke teqezkirinê bigirin dema we serlêdena xwe timam kir. Eger email nehatibe qitûya peyaman, dosyeya spam/junk kontrol bikin.

## Desteka Gehînbariya Serlêdanê ji bo Kerran an jî Kesên bi Neşiyanbarîtî

Serlêderên ku Kerr in an jî astengiyeke wan heye û hewcedarê alikariyê ne ji bo ku serlêdenên xwe yên bexşê timam bikin dikarin serî li piştevaniyê bidin ji bo standina mesrefên xwe yên alîkariyê ji Xizmetdarên Xizmeta Alîkariya serlêdenê. Her sal heta $500 ji bo her serlêderê xwedî maf tê dayîn. Ji kerema xwe re herî kêm şeş hefte berê dîroka dawî ya serlêdenê xwe bigihînin Gerînendeyê Bernameya Bexşê ji bo ku mafdariya xwe teqez bikin, piştevaniya desteka serlêdenê bixwazin û pêvajoya paredanê ji Xizmetdarên Xizmetê bişopînin. Serlêdenên desteka serlêdenê divê ji aliyê Gerînendeyê Bernameya Bexşê bê qebûlkirin.

## Divê ez çi amade bikim?

Sê beşên sereke yên serlêdena bexşê ew in: *Agahiyên Rahêneriyê, Jiyanname/CV, û Materyalên Destekê.*

- Ji kerema xwe li Pêveka pê re binêrin ji bo pirsên derbarê Agahiyên Rahêneriyê
- *Jiyanname/CV* hem ji bo serlêder (Hunermendê Nûhatî û Penaber) û hem jî bo hevserlêder (rahêner) tê xwestin, da ku ezmûna xwe ya hunerî berfireh bikin.
- *Materyalê destekê* ji bo pêvajoya nirxandinê girîng in. Divê hemû serlêder mînakên karên xwe yên hûnerî yên demên dawî yên girêdayî rahêneriyê radest bikin. Herî kêm mînakek divê ji 2 sal berê bin. Materyalên destekê ya ji rahêneran li gor xwestinê ye lê bê radestkirin baştir e.
  - Vîdeo/Deng: lînkekê (Vimeo, YouTube û hwd.) û şîfreya dosyeyê (eger lazim be) bidin. Dosyeyên vîdeo û deng divê ji 3 deqîqeyan zêdetir nebe.
  - Wêne: lînkekê û şîfreya (eger lazim be) malpera ku wêne lê barkirî ne, bidin. Hûn her wiha dikarin wêneyên JPEG ên karê xwe jî bar bikin. 5 wêne SERÊ beşa Materyalên Destekê tê destûrdayîn, û zêdetirîn jî 15 wêne.
  - Mînaka Nivîsê: dosyeyeke PDF bar bikin, herî zêde 15 rûpel bi navbera cot-valahîdayî.
- Panela nirxandina bexşê dê 5 deqîqeyan an jî kêmtir veqetîne bo nirxandina materyalên destekê ji bo her serlêdenê. Berhem, ji ber vê çendê, dibe ku bi tevahî neyên dîtin. Divê mezinahiya dosyeyan ji 200 MB derbas neke.
- Materyalan bi rêya Google Drive an jî Dropbox radest nekin. Eger hûn profîlên xwe yên Facebook an jî Instagramê radest bikin, teqez bikin ku ew hesabên giştî ne.

## Serlêdena min çawa tê nirxandin?

- Serlêdan bi rêya pêvajoyeke nirxandina serbixwe tên nirxandin: panela serbixwe ya hunermendên li ser kar û xebatkarên hunerê biryar dide ka kîjan serlêdan dê ji bo piştevaniyê bên pêşniyarkirin. Pêşniyariyên piştevaniyê ji aliyê Rêveberên TACê tên qebûlkirin.
- Pisporên serbixwe hatine hilbijartin ji ber tecrûbe û zanatiya wan a di sektora hunerê ya Torontoyê de û her wiha ji bo ku temsîliyeta adilane misoger bikin ji bo komên pêşîtiya wekheviyê yên diyarkirî li gel TACê.
- Serlêdan di asteke hevberdar de tê nirxandin û biryarên piştevaniyê li gorî hebûna piştevaniyê, armancên bernameyê, û krîterên nirxandinê yên li jêr tên dayîn:
  - Nirxa hunerî (kalîte) ya serlêdanê çi ye?
  - Gelo rahênerî dê piştgiriyê bide armancên diyarkirî yên serlêder û pêdiviyên wan wekî hunermendekî nûhatî?
  - Gelo dê rahênerî tecrûbeyeke biwate bide serlêder?

- Gelo rahêner xwedî tecrûbe û jêhatinan e ji bo vê rahêneriyê?
- Gelo rahêner armancên kesê ku tê elimandin fêm dike û piştgirî dide wan, û gelo ew ji bo bikaranîna tora xwe ya li ser navê hunermendê nûhatî dilxwaziyê nîşan dide?
- Gelo plana rahêneriyê rasteqîn e?

- Panela nirxandina bexşan dê armancên hunerî yên xwe-diyarkirî, jîngeha erdnîgarî û hunerî, çavkaniyên berdest û qonaxa pêşveçûna hunerî ya her serlêder li ber çavan bigire.

- **Krîtera Pêşîtiya Bernameyê:** Ev bername dê pêşîtî bide hunermendên ku ji ber ku nûhatî û/an penaber in, li Torontoyê di pêşxistina pratîka xwe ya hunerî de rastî astengiyan tên.
- Di nav [Çarçoveya Wekheviyê] ya TAC'ê de Polîtîkaya Pêşîtiya Wekheviyê heye, ku dibêje eger ji yekê zêdetir serlêdenên baş hatine nirxandin ên di dorekê de xwedî heman mafdariyê ne lê piştevaniya bexşê kêm be ji bo hemû namzetên ku vê destekê heq dikin, serlêdenên ku xwe wek aidê yek ji komên pêşîtî yên wekheviyê yên Meclisa Hunerê ya Torontoyê dabin nasandin an jî di nav van de bin an jî xizmetê didin hunermendên ji wan koman dê pêşîtiyê wergirin.
- Biryarên panela nirxandina bexşê biryarên dawî ne.

## Ez ê çawa encamên serlêdenan bizanim?

TAC ê ji we re emailekê bişîne dema encam diyar bûn û hûn ê bikaribin bikevin TAC Grants Online ji bo ku encaman bistînin. Agahdarî dê di nav du mehên piştî dîroka dawî ya serlêdenê de were stendin.

## Eger projeya min biguhere dê çi bibe?

Piştevanî dê bi tenê ji bo armancên ku di kurteyê de hatine behskirin bên bikaranîn. Guherînên sereke yên plana xebatê ya projeyê divê demildest ji TAC re bên ragihandin.

## Piştî ku min projeya xwe xilas kir ez ê çi bikim?

Ji wergiran tê xwestin ku raporeke dawî ya projeyê amade bikin. Rapora dawîn bi riya portala bexşînê ya TACê serhêl tê dagirtin û şandin. Mohleta teslîmkirina rapora dawîn dê di nameya ragihandinê ya bexşînê de cih bigire. Heta ku raporên li ser fonên berê ji hêla TAC ve neyên wergirtin û pejirandinserlêdenên wêdetir ji bo Bernameyên Projeyên Stratejîk ên TAC* nayên qebûlkirin.

*Bernameyên TAC Leaders Lab, Newcomer & Refugee Artist Mentorship, û TAC-CS Digital Solutions Incubator di nav îstîsnayan de ne. Heke pirsên we li ser van îstîsnayan hebin bi Gerînendeyê Bernameya TAC re têkilî daynin.

## Ji bo vê bexşê pîvan an jî pêwîstî çi ne?

- Serlêderên serkeftî dê Nameya Peymanê wergirin. Nameya Peymanê dê hûrgiliyên şert û mercên bexşê nîşan bide. Nameya Peymanê divê bê îmzekirin û li *TAC Grants Online* bê barkirin beriya ku bexş bikare bê dayîn. Nameya Peymanê her wisa rewşên ku pêwîstî bi paşvegerandina bexşê bibîne jî rave dike.
- Wergirên bexşê divê desteka Meclîsa Hunerê ya Torontoyê li hemû materyalên nivîskî yên girêdayî çalakiyên ku bexş ji bo vê hatine dayîn kifşe bike. Logoya TAC'ê li ser malpera me ya webê peyde dibe; taybetiyên mezintî û bicihkirina logoyê divê li gor yên tevkarên din be ku alîkariyeke aborî ya manendî dabîn kirine. Li şûna logoyê, wergir dikare gotina "bi desteka Bajarê Torontoyê bi rêya Meclîsa Hunerê ya Torontoyê hatiye hilberandin bi kar bîne."
- Meclîsa Hunerê ya Torontoyê derbasî peredayîna elektronîk bûye. Eger serlêdena we bê qebûlkirin, dê ji we bê xwestin ku hûn agahiyên hesabê banqê yê wergirê bexşê bikevinê ku li gor Navê serlêder e yê di Nameya Agahdariyê de. Agahiyên banqê jî bi Nameya Peymanê û Pêwîstiyên Nameya Ragihandinê tên radestkirin.
- Bajarê Torontoyê pêwîst dibîne ku hemû rêxistin û takekes divê polîtîkaya dijî-cudahiyê wek şerta girtina bexşê ya ji Bajêr qebûl bikin. Dê ji hemû serlêderên serkeftî bê xwestin ku Deklarasyona Qanûngeriya Pêkhatina li Dijî Şepirzekirinê/Cudahiyê û Polîtîkaya Bajêr îmze bikin û radest bikin.

- Wergirên bexşê pêwîst e ku qeydên hesabê xwe yên rekûpêk yên derbarê bexşa ji Meclîsa Hunerê Torontoyê standî bigirin. Formeke T4A dê ji hêla TAC ve bê weşandin ji bo serlêderên Takekesî û divê ji bo armancên dahata bacê bê bikaranîn.
- Li gel şert û mercên bexşê yên beriyê hatine behskirin, TAC mafê derxistina şert û mercên din jî derbarê dayîna bexşê li ber destê xwe digire (wek erêkirina cih, bername, çavkaniyên din ên bexşdayînê, û yên din). Şert û mercên taybet ê di Nameya Peymanê de bên nîşandan.

## Zêdetir pirs

Gerînendeya Têkiliya Bernameyê

Liza Mattimore

416-392-6802 xeta hundir 231

liza@torontoartscouncil.org

**Eger hûn hunermendeke penaber an jî nûhatî ne û hewcedariya we bi peydakirina rahênerekê yan jî xizmetên wergerê hebe, ji kerema xwe re xwe bigihînin Liza Mattimore berî 13ê Adara 2026an.**

## PÊVEK

Pirsên derbarê Hûrgiliyên Rahêneriyê yê di forma serlêdenê ya 2021 de:

1) Daxuyaniya Hunermend: Pratîka xwe ya hunerî rave bikin, hunera ku hûn diafirînin û sebeba çima hûn wê diafirînin. Hûrgiliyên tecrubeya çêkirina vê hunerê li welatê xwe û li Kanadayê jî bixin nav.
2) Armanc: Ezmûnên xwe yên hunerî ji dema hatina xwe ya Torontoyê ve rave bikin. Hûn di rahêneriya xwe de çi hêvî dikin? Ev rahênerî dê çawa ji we re bibe alîkar ku hûn bigihîjin armancên xwe û wekî hunermendek pêşve biçin? Hûn çima dixwazin bi vî rahênerî re bixebitin?
3) Daxuyaniya Rahêner: Hûn çima dixwazin rahêneriya vê hunermendê bikin? Derbarê pratîka wan a hunerî de çi bala we dikişîne? Bi referansa tecrubeya ku hûn ê bînin vê rahêneriyê, rave bikin hûn çima guncaw in bo vê hunermendê.
4) Plana xebatê: rave bikin bê ka hûn ê çawa bi hev re bixebitin, bername û plana xebatê ya çalakiyên rahêneriyê jî tê de. Agahiyên wek dîrok û cihê çalakiyan û detayên çalakiyan jî bixin nav.
5) Bandordarî: Ev bername ji bo pêşveçûna we, û entegrasyona we li Torontoyê destek bike hatiye avakirin. Bi vê armancê, encamên ku hûn dixwazin pêk bînin çi ne? Çi dê li jiyana we biguhere di dawiya vê rahêneriyê de? Hûn ê tecrubeya rahêneriyeke serkeftî çawa rave bikin?